

Rewşenbîr û îradeya rexnegirtinê

Hoşeng Şêx Mihemed

Îrade, di sadetirîn pênasîna xwe de, têgehiştin û dunyabînî û hoşmendî ya mirovî ye bo dunya û jiyan û hebûn û têgehên ciyawaz yên ebstirakit û neebstirakit.

Têkist, dişêt bibe hilgir û berhemê îradeya nivîserî yan rewşenbîrî, heger hat û rewşenbîr şiya bi îradeyek hiziriyane û hoşmendiyane, li hember îradeyên nehizrî û neberaqilane berhemên xwe di forma rexneyek wêrekane biweşîne.

Diyar e di rewşenbîriya kurdî de, hêş ew îrade çênebûye ku bişêt rexneyek tokme û pêşketî dabimezrîne. Diyar e rewşa rewşenbîriya Kurdistanê bi dirêjahiya dîroka xwe şiyaye çendên şayir û çîroknivîs û heta romannivîsên baş û hêja pêşkeş bike. Rewşenbîriya me şiyaye mozîkek baş û hunerek şêwekarî û heta şanoyî û sînemakarî jî ta radeyekî berhem bîne, lê hêş neşyaye rexneyê çêkbike.

Egerên çênebûna rexneyê wek bizavek xurt di rewşenbîriya me de, beşek mezin jê bo rewş û seqa kulturê kurdî, bi giştî, dizivire ku hêş nebûye xudan ew îrade ku bişêt rûberûbûneweyên hizrî di navbera wan nivîser û hunermend û rewşenbêrên me de çêbike. Êk ji karîgertirîn rêgirên

çênebûna wî îradeyî jî, eqliyeta nivîser û rewşenbîrên me ne li hember rexne û îradeya rexneyî, ku hêş piraniya nivîserên me, rexneyê wernagirin û bi sadetirîn astê hizirî wek babetek kesokî û palderên nemeirîfî pênase dikin. Diyar e kêm mesreftirîn hizir ew e, demê her rewşenbîrek rexneyî li nivîserekî bigire, êkser bê dudilî, meseleyê dike di formek kesayetî û çi behayên meirîfî û zanistî û edebî û rewşenbîrî di babetî de nabîne.

Vê çendê wekiriye ku îradeyek rexneyiyane li cem rewşenbîr û nivîserên kurd çênebe û kêm kes nebin heger yên din xudan ew îrade nînin ku rexneyê li kesên dî yên nivîser û rewşenbîr bigirin.

Bo min bi xwe, ew îrade ye wek pêwîstiyek nîmçe reha dibînim ku her çu nebe em pêkol bikin di nav ew rewşenbîriya bê rexne em tê de dergehekî li rexne û îradeyeka rexnegir û rewşenbîriyane vekin. Bi guman ve, ez dibêjim ku renge gelek hewlên seretayî dê bine cihê aloziyên kesayetî û girjên nivîseran ku bi astek sadeyî dûr ji bihayên meirîfî sewdayê bikin. Lê diyar e ew jî pêwîstiyek e û pêwîst e xudan îradeyên rexneyî wî erkî bicih bînin, heta nivşek nû hizir û mejyên wan bi wan gotarên rexneyî û rûberûbûneweyên hizirî û nehizirî aşna bibin û ew jî bişên îradeyek hoşmendanetir û rexneyek hizrîtir li ser ava bikin.